# Rêbera Danasînê

Ji bo penaberên ji aliyê Sponsoriya Civakî ve hatine pêşwazîkirin

## Danasîn

Beriya hûn vê rêberê bixwînin, tika ye pirtûkçeya *Hûn bi xêr hatin UKê* bixwînin, ku tê de agahiyên bi hûrgilî yên têkildarî xizmetên cuda yên UKê hene ku hûn ê piştî cîwarbûnê xwe bigihînine wan. Di vê rêberê de me hewl da ku em agahiyên di her du dokumentan de dubare nekin. Ji dêvla vê ve em li ser komên Sponsoriya Civakî û li ser hindê hûr bûn ka koma we ya Sponsoriya Civakî wê bi we re çawa bixebite ku hûn xwe bigihînin qadên bingehîn yên piştgiriyê.

Komên Sponsoriya Civakî ji dilxwazan pêk tên ku bi mehan û bi salan beriya hatina we dixebitin ku ji we re xanî bên peydakirin, lêkolîn bikin ka hûn ê çawa xwe bigihînin xizmetan û ew ê ji we re çawa bibin alîkar ku hûn dikaribin li ser piyên xwe bimînin. Ev kom di pêvajoyeke zehmet ya serlêdanê re derbas bûne û ji aliyê hikûmeta UKê ve wekî alîkarên we yên giştî hatine pejirandin. Ew bi hikûmeta UKê û meclîsa herêmî re dixebitin ku hatina we plan bikin û herî kêm salekê alîkariya malbatên we bikin. Wan ji we re ji bo heta du salan ciyê mayînê peyda kiriye.

Sponsoriya Civakî bi hikûmeta UKê re peymanekê îmze dike ku ji we re alîkariyê pêşkêş bike. Ew qebûl dikin ku ew ê van bikin:

- Peydakirina fona destpêkê ya £200 ji bo her endamekî malbata we. Dibe ku heta alikariyên ji bo we bên standin evbi teqsîtan bê dayîn.
- Ji bo heta 24 mehan peydakirina piştgiriya entegrasyonê.
- Peydakirina ciyekî lêmanê ji bo 24 mehan.
- Alîkariya ji bo serlêdanên we yên ji bo alîkariyan, qeydkirina bi GPa we re û ji bo germkirin, av, elektrîk û gazê peywendîdanîna bi şirketên têkildar re.
- Pesendkirina qeydiya zarokan li dibistanê.
- Ji bo mezinan 12 mehan her hefte 8 saetan peydakirina derfetên fêrbûna zimanê Îngilîzî.
- Pêşkêşkirina alîkariya ji bo firsendên oryantasyonê, firsendên kar yan jî yên xebatên dilxwaziyê.
- Di hefteya we ya pêşî de peydakirina tercûmanekî.

Tiştên ku koma Sponsoriya Civakî ji bo alîkariya we pêşkêş bike tenê ne ev in, lê peywirên wan ev in.

Reset Communities and Refugees dezgeheke xêrxwaziyê ye. Reset ji departmana Hikûmeta UKê û ji Wezareta Navxweyî fonan distîne ku çavkaniyan (yên wekî vê

rêberê) biafirîne û komên Sponsoriya Civakî perwerde bike ku bi awayê herî baş piştgiriya we û malbatên we bikin. Reset wê piştî hatina we çend caran bi we re û bi koma we re bi awayên cuda hevdîtinan bike ku cîwarbûna we teqez bike û ku hûn dikaribin li ser cîwarbûnê bi kesên din yên ne ji komê re jî biaxivin. Ev hevdîtin wê bi tercûmanên profesyonel re li ser telefonê yan jî înternetê pêk bên.

Em, wekî beşek ji wan kesan ku hejmara kesên bi riya Sponsoriya Civakî tên zêde dikin, dibêjin hûn bi xêr hatin UKê.  Em di jiyana we de ji we re gelekî serkeftinê dixwazin.

# Tercûmanî

Koma we wê wekî beşeke bernameya Sponsoriya Civakî pereyan berhev bike û hinek ji vî pereyî ji bo lêçûnên tercûmaniyê xerc bike. Dibe ku ev ji bo tercûmaniya rasterast, ya li ser telefonê yan jî înternetê bê dayîn. Dibe ku xizmetên tercûmaniyê buha bin û dibe ku kom ji ber bisînorbûna budçeyê tenê di gavên giring de tercûman bîne.

Gelek kom dikarin tercûmanên dilxwaz jî bi kar bînin. Hin caran tercûmanên dilxwaz endamên çalak yên koman in yan jî endamên civaka herêmî ne ku dikarin bi zimanê we biaxivin. Tercûmanên dilxwaz pere nastînin û dibe ku wan tercûmaniya profesyonel nekiribe.

Gelek dabînkarên xizmetan dikarin ji bo randevuyên we tercûmanan peyda bikin. Wekî mînak, neştergeriya GP dikare xwe bigihîne tercûmanên telefonê, lê divê dema hûn randevu digirin ji wan re bibêjin ku ji we re tercûmanek divê. Heke randevuyeke we ya nexweşxaneyê hebe, wê çêtir be ku hûn di pêşiyê de bibêjine wan ku ji we re tercûmanek divê. Gelek nexweşxane dikarin tercûmanan bînin randevuyan, lê dîsa jî divê hûn di pêşiyê de ji wan re bibêjin ku ji we re tercûmanek, bi taybetî jin yan mêr be divê. Û li Navenda Kar, dibe ku kom ji bo çend randevuyên pêşî perê tercûmaniya rûbirû bide, paşê wê hewce bike ku Navenda Kar ji bo randevuyan dest bi peydakirina tercûmanan bike. Navenda Kar, tenê gava hûn yan jî kom bixwazin, wê tercûman peyda bike.

Tercûmanî xizmeteke bi pere ye û peywendiya ku tercûman bi we re dayne peywendiyeke profesyonel e. Heke hûn xwe rehet hîs nekin, hûn dikarin komê ji vê agahdar bikin. Li gorî rewşê, ew dikarin hewlê bidin ku ji we re tercûmanekî din bê peydakirin.

# Perwerdehî

**Perwerdehiya Zarokan**

Hemû zarokên li UKê divê piştî 5 saliya xwe (li Îrlendeya Bakur 4) heta 16 saliya xwe herin dibistanê, hemû kesên di navbera 16-18 salî de yan divê herin dibistanê yan jî di beşeke perwerdehiyê de bixebitin. Piraniya dibistanan têkel in ku keç û kur di polan de bi hev re dixwînin. Heta 18 salî dibistan belaş in, lê hin dibistanên taybet pere distînin. Piraniya dibistanan sekuler in, lê dibistanên belaş yên dînî jî hene ku zarok dikarin herinê.

Beriya hatina we, koma we wê herî kêm dibistaneke li herêma we bibîne ku tê de ji bo zarokên we cî hebe. Dibe ku ev ne dibistana herî nêzîkî mala we be, ji ber ku di koma her temenî de ciyên vala bisînor in. Endamên komê dê beriya hatina we dibistanê agahdar bikin, da ku ew dikaribin ji bo ku zarokên we bigihîjin asta hevalên xwe alîkariya ekstra plan bikin.

Li UKê tê hêvîkirin ku welî beşdarî perwerdehiya zarokan xwe bibin û dibe ku spartekên malê bidin zarokên biçûk jî. Hin kesên ji koma we wê ji bo peywendiya bi dibistanê re ji we re bibin alîkar, loma hûn ê zanibin ka wekî dê yan bav çi li pêşiya we ye.

**Perwerdehiya Mezinan**

Wekî temenmezinekî ku ji sosyalê alîkariyê distîne divê tu û temenmezinên din yên malbatê heta hûn ji bo kar amade bibin hefteyê heşt saetan beşdarî dersên înglîzî bibin ku wekî ESOLê jî tê binavkirin. Koma te wê van dersan ji bo te eyar bike û dibe ku ev ji çavkaniyên fêrbûnê yên cuda pêk bê. Wekî mînak, dibe ku tu rojekê li koleja herêmê herî dersekê û rojeke din li malê dersa taybet bibînî. Mamosteyên we wê şiyanên we yên zimanî binirxînin. Heke ji te re ji bo nivîsandinê alîkarî bivê, koma te dê ji bo peydakirina çavkaniyên pêwist alîkariya te bike.

Fêrbûna zimên, bi taybetî ji bo temenmezinan dikare zehmet be. Nelezînin û heke hûn di demeke zû de bi pêş nekevin, bila hêviyên we neşikên.

Heke li welatê we belgeyên we yên akademîk yan jî profesyonel hebin, ji koma xwe bipirsin ka ev tên wergerandin yan na. Mixabin ji bo hin pîşeyan tenê belgeyên ji UKê hatine wergirtin tên qebûlkirin. Gelek penaberan karibûye piştî demekê li UKê belgeyên xwe yên pîşeyî dîsa wergirin, loma heke hûn tiştekî wisa bixwazin bi koma xwe re biaxivin.

RESET Training and Support

# Tenduristî

Di pirtûkçeya *Hûn bi xêr hatin UKê* de hûn ê agahiyên derbarê Xizmeta Tenduristiyê ya Neteweyî (NHS) li Înglistan, Wales û Skotlandê yan jî Venêrîna Tenduristiyê û Civakî (HSC) li Îrlendaya Bakur û her wisa derbarê xizmetên hûn dikarin bi belaşî jê fêdeyê bibînin de agahiyan bibînin. Koma we ya Sponsoriya Civakî wê zanibe ka we û endamên malbata we ji bo bijîşkê herêmî ku dibêjinê GP çawa û li ku derê qeyd bikin û ew ê vê pêvajoyê ji bo we hêsan bikin. Yek an jî du endamên komê beriya hatina we ya UKê derbarê rewşa tenduristiyê ya endamên malbata we de ji Nirxandina Tenduristiya Koçberan ya ji aliyê IOMê ve hatî pêkanîn agahî wergirtine. Ew ê van agahiyan ji bilî bijîşkê hûn li balê hatine qeydkirin bi tu kesekî din re parve nekin. Beriya hûn derkevin ser rê hûn ê van agahiyan wergirin ku hûn di hevdîtinê de bidin GPê xwe.

Heke problemeke we ya nelezgîn hebe, hûn dikarin ji koma xwe bipirsin ku ji bo randevuyeke bi GPê we re ji we re bibin alîkar ku ev bijîşk dê ji we re dermanan binivîse û heke pêwîst be we bişîne servîseke pispor. Piştî destpêka pandemiyê hin GP tercîh dikin ku hevdîtinên pêşî yên bi nexweşan re ne rûbirû lê li ser telefonê yan jî înternetê pêk bînin. Gelekên nûhatî şaş dimînin ku ji bo rewşeke nelezgîn wergirtina alîkariya bijîşkî gelekî dereng dimîne. Bawer bikin, hemû brîtaniyên ku li UKê hewlê xwe bigihînin xizmetên tenduristiyê bi heman derengiyê re rû bi rû dimînin.

Ji ber ku hûn hê nû tên UKê, hûn ê bibînin ku hûn ê ji bo kontrolên birêkûpêk vexwendnameyan wergirin. Wekî mînak, jinên temenê wan di navbera 25-49an de her sê salan carekê ji bo kontrola devê malzarokê tên vexwendin.  Heke derbarê van randevuyan de pirsên we hebin bi kom yan jî GPê xwe re biaxivin.

Ji bo alîkariya tenduristiyê ya lezgîn divê hûn telefonî 999 bikin, ji bo rewşên nepirlezgîn lê nabe li benda randevuya GPê bimînin hûn dikarin telefonî 111 bikin û ew ê alîkariya pêwîst bigihînin we. Ji bo rewşên biçûktir yên wekî sermagirtinê hûn dikarin ji dermanxaneyên herêma xwe alîkariyê bixwazin lê ew ê ji bo sermangirtineke jirêzê antîbiyotîkan nedin we.

Wekî ku di beşa Tercûmaniyê ya vê rêberê de hatiye diyarkirin, xizmetên tenduristiyê li UKê, ji bilî dermanxaneyan û diransazan, divê ji we re tercûman peyda bikin. Lê dîsa jî dibe ku ev li ser telefonê be. Dibe ku ew nikaribin dema standina randevuyê tercûmanekî peyda bikin, loma heta hûn dikaribin randevuyan bi serê xwe bistînin, endamên komê dikarin alîkariya we bikin.

Li UKê piştgirî ji bo venêrîna diranan tê dayîn lê ne belaş e. Koma we wê bibe alîkar ku hûn û endamên malbata we li ba doktorekî diranan bên qeydkirin û ew ê bibêjin

ka perê vê çawa tê dayîn.  Niha li UKê lîsteyên dorê yên li doktorên diranan gelekî dirêj in.

# Mal

Koma te wekî parçeyeke Sponsoriya Civakî ji bo te û malbata te ji bo 24 mehên pêş xaniyek yan jî apartmanek dabîn kiriye. Wateya vê ev e, heta du salan heta ku hûn nexwazin hûn ne mecbûr in bar bikin.

Li UKê carê xanî gelekî buha ne, loma gelek kom di peydakirina xanî û apartmanên ji bo malbatên piştgiriyê didinê de rastî zehmetiyan tên – dibe ku koma we jî rastî zehmetiyan hatibe. Heke ciyê ji we re hatî dabînkirin ne bi dilê we be, hûn dikarin vê ji endamên komê yan jî ji xwediyê xanî re bibêjin, û ew ê ji bi guhertinên maqûl tiştê ji destê wan tê bikin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku lijneya herêmî kontrol û pesend kiriye ku xanî/apartmana we ji bo malbata we guncaw e. Heke hûn bixwazin bar bikin, kom ne mecbûr e ku ji bo peydakirina ciyekî din ji we re bibe alîkar.

Her çend hûn beşdarî peydakirina malê nebûne, dîsa jî ew der mala malbata we ye û tevgeriyana li gorî mercên peymana kirê yên wekî dana heqê kirê û nekişandina cigareyê di nava xanî de ji berpirsyariyên we ne. Ev her wisa tê wê wateyê ku hûn dikarin xwe li malê hîs bikin. Hûn û malbata xwe dikarin guhertinên şexsî bikin û rêgezên xwe diyar bikin (wekî derxistina solan li navmalê). Heta ku hûn dikaribin bi serê xwe pêk bînin, endamên komê dê alîkariya we bikin ku hûn têkildarî tamîrkirinên li nav xanî yan jî problemên din bi riya tercûmanekî bi xwediyê zanî re biaxivin.

Heta ku hûn dest bi karekî bikin hûn ê heqê kirê ji pereyê ku ji aliyê Hikûmeta UKê vê li gel alîkariyên civakî bi taybetî ji bo kirê tê dayîn, bidin. Dibe ku pereyê hikûmet ji bo kirê dide têra temamê kirê neke, wê çaxê kom ji fona hatî dayîn ji bo 24 mehan li ser heqê kirê temam dike ku em dibêjinê teqwiyeya kirê.

Kom dê wekî parçeyeke piştgiriyê:

- Kelûpelên bingehîn ji bo malê dabîn bike
- Peymana kirê bi zimanê we ji we re rave bike
- Hînî we bike ka hûn ê piştî 24 mehan çawa li malekê bigerin
- Alîkariya we bike ku hûn probleman ragihînin xwediyê xanî
- Ji we re bibe alîkar ku hûn şiyanên xwe xurt bikin ku hûn piştî 24 mehan li malekê bigerin

Kom dê van neke/ne mecbûr e van bike:

- Dana fatureyên we, yên înternetê jî
- Gava hûn ne kêfxweş in, alîkariya peydakirina maleke din ji bo barkirinê

- Bêagahî hatina mala we – heke ew vê bikin, mafê we heye ku hûn ji wan re bibêjin ku bêagahî neyên.

# Rewşa Qanûnî

Gava hûn wekî penaberên cîwarbûyî gihîştin UKê, hûn û hemû endamên malbata we mafê rûniştinê yê daîmî (ILtR) werdigirin. Wateya vê ev e ku hûn dikarin bi awayê qanûnî li UKê bimînin, bixebitin û ji fêdeyan sûdê wergirin. Hûn û malbata we dikarin heta ku bixwazin li UKê bimînin – lê heke hûn ji bo demên dirêj ji UKê derkevin, dibe ku hûn mafê rûniştê ji dest bidin. Pênc salan piştî hatina we ya UKê hûn û endamên malbata we dikarin serî li welatîbûna UKê bidin û pasaportên UKê bistînin.

Hûn û hemû endamên malbata we dê wekî îsbata rewşa qanûnî Destûra Rûniştinê ya Biyometrîk (BRP) wergirin. Ev kardek e ku ji bo îsbatkirina nasnameyê tê bikaranîn û mafê xwendina we ya li UKê û mafê xwegihandina hemû xizmetên civakî û fêdeyên mafê we tê de heye, pesend dike. Lê ev kard ji bo gera derveyî welat nayê bikaranîn. Hin kesên ji koma we ya Sponsoriya Civakî wê hema piştî gihîştina we karda we wergirin û demildest bidin endamên malbata we. Heke hûn kardên xwe yên BRP winda bikin yan jî agahiyên we biguherin, pêwist e hûn Wezareta Navxweyî agahdar bikin.

Heke zarokên we û yên partnera/ê we yên li UKê çêbûyî hebin, ew ê jî wekî we heman statuya qanûnî wergirin. Piştî ku bebik çêbû, divê hûn wê/wî li lijneya herêmî qeyd bikin û paşê Wezareta Navxweyî agahdar bikin. Sponsoriya Civakî wê di vê pêvajoyê de alîkariya we bike.

Heke derbarê yekbûna malbatî yan jî ji bo pevrejiyana li UKê ji derveyî welêt anîna endamên malbatê de pirsên we hebin, ji bîr nekin ku ev ji ber rêgezên koçberiyê yên niha gelekî zehmet e. Kom nikare biryarê bide yan jî bandorê li hindê bike ka kî ji bo cîwarbûnê bên UKê – biryara vê tenê di destê hikûmeta UKê de ye. Kom her wisa nikare şîretên qanûnî û yên têkildarî koçberiyê bide we, lê ew dikarin peywendiya we bi şîretkarên profesyonel re deynin lê ew ne mecbûr in ku heqê van xizmetan bidin.

# Fêde

Gava hûn pêşî gihîştin UKê pêwist e hûn ji bo alîkariyên sosyal yên ji hikûmeta UKê serlêdanê bikin; koma Sponsoriya Civakî dê ji bo vê alîkariya we bike û ji bo malbata we ji Navenda Kar randevuyekê bistîne. Pereyê alîkariyê yê pêşî bi piranî di nav şeş hefteyên piştî randevuyê de tê dayîn, lê carê demeke dirêjtir jî dewam dike.

Piraniya kesên li UKê piraniya pereyê xwe yê alîkariyê ji Universal Creditê werdigirin – ev pereyekî mehane ye ku heqê kirê, heqê lêçûnên jiyanî û (heke hebin) pereyê zarokan tê de ye, lê li gorî mercan dibe ku mafê we ji bo hin alîkariyên din jî hebe – hûn dikarin vê ji Navenda Kar bipirsin.

Heke hûn di temenê xebatê de bin Navenda Kar dê ji we bixwaze ku hûn hin mercan bicî bînin. Navê vê pabendbûna daxwazkariyê ye. Pêşî dibe ku ev fêrbûna înglîzî be, lê di nav demê re dibe ku ji we bê xwestin ku hûn li karên dilxwazî û yên bipere bigerin. Heke hûn van mercan bicî neynin yan jî bêyî sedemeke hêja beşdarî randevuyên Navenda Kar nebin, dibe ku pereyê we yê alîkariyê bê birîn.

Mîqtara hûn ê wergirin dê têkildarî mercên we yên şexsî be, loma ev ji bo hemû malbatan ne wekî hev e. Hûn ê ji ber penaberiya xwe rastî nêzîkbûneke cuda neyên – malbatên brîtanî jî her wekî malbata we xwe digihînin heman alîkariyan. Koma we nikare bandorê li hindê bike ka hûn çiqas alîkarî werdigirin, lewre hikûmet biryara vê dide. Dibe ku debara li ser pereyê alîkariyê zehmet be û hin malbat ji ber bisînorbûna pereyê ji Universal Creditê tê şaş bimînin. Koma we dikare ji bo rêveberiya debarê alîkariya we bike û ji bo tercîhên aborî yên mentiqî pêşniyaran bide we.

Gava hûn dest bi karekî bikin divê hûn demildest Navenda Kar agahdar bikin û pereyê alîkariyê dê li gorî her senteke hûn qezenc dikin, kêm bibe. Lê dîsa jî hûn dikarin pereyekî diyarkirî ji karekî bipere qezenc bikin ku pereyê we yê alîkariyê kêm nebe. Ji bo agahiyên têkildarî vê hûn dikarin bi komê yan jî Navenda Kar re biaxivin.

RESET
Training and Support

# Kar

Mafê we heye ku hûn hema piştî roja gihîştina UKê û wergirtina BRPê bixebitin, lê dê rasterast ji we re kar neyê peydakirin. Ji bo hema bibêje hemû karên li UKê zanîna înglîzî divê, loma piraniya nûhatiyan beriya li karekî bipere bigerin bala xwe didin ser dersên înglîzî û karên dilxwazî yên ji bo pêşvebirina înglîziya xwe ku dikaribin karekî bi meaşekî baş peyda bikin.

Ji bo hin karan zanîna pîşeyî û sertîfîka lazim in ku divê hûn li UKê bi dest bixin. Gelek pîşe hene ku li hemû welatan ne wekî hev in. Heke di pîşeyekî de zanîna we hebe û hûn bixwazin li UKê wî karî bikin, nexwe ji koma xwe bipirsin ka ji bo vê pêdiviya we bi çi heye.

Dibe ku pêvajoya peydakirina karekî li UKê ji ya hûn dizanin cudatir be. Tiştekî standard e ku kardêr CVyekê bixwazin û hin caran nivîseke serlêdanê yan jî formeke serlêdanê bixwazin. Paşê namzedên herî lêhatî ji bo hevdîtineke kar tên vexwendin û ji wan dipirsin ku behsa xwe bikin û bibêjin ka çima vî karî bidin wan. Koma we dikare ji bo fêrbûna vê pêvajoyê ji we re bibe alîkar yan jî berê we bide rêxistinên herêmî yên vî karî dikin.

Ji bîr nekin, gava hûn dest bi kar bikin divê hûn Navenda Kar agahdar bikin. Hûn ê bi karekî tam-demî ji alîkariya Universal Creditê zêdetir qezenc bikin, lê em pêşniyar dikin ku hûn pêşî fêrî înglîzî bibin ku hûn dikaribin paşê karekî çêtir peyda bikin.

# Parastina Ewlebûnê

Li UKê mafê her kesî heye ku di nav ewlehiyê de be û ji tundiyê dûr be – heke hûn yan jî kesekî hûn nas dikin ne di ewlehiyê de be yan jî rastî tundiyê tê, hûn dikarin bi koma xwe re biaxivin. Dilxwazên koma we dê li ser tiştê hûn dikarin bikin û gilîkirina mijarê, û ji bo wergirtina alîkariyê bi we re biaxivin. Heke hûn tundiyekê gilî bikin, ew nikarin li ser vê bêdeng bimînin, lê ew dikarin mijarê bi qasî ku hûn jê aciz nebin bi nepenî bigirin dest.

Endamên koma Sponsoriya Civakî di bin banê dezgeheke xêrxwaziyê de bi dilxwazî piştgiriya we dikin û heke ew hîs bikin yek di xetereyê de ye, pêwist e ew vê ji dezgehê re ragihînin.

Heke hûn di nav xetereyeke lezgîn de bin, telefonî 999 bikin – ji operator re bibêjin hûn bi çi zimanî diaxivin, û ew ê tercûmanekî bînin ser telefonê.

Em hêvî dikin ku hemû kesên li UKê bi rêz û hurmet pêşwaziya we bikin, lê dîsa jî heke hûn rastî rasîzm yan cudakariyê bên, hûn dikarin li ba polîs giliyê vê bikin yan jî ji bo alîkariyê bi koma xwe re biaxivin.

Heke hûn bixwazin bi awayê qanûnî giliyê endamekî koma xwe bikin, rêgezeke komê heye ku giliyê we ragihînin asta jortir û binirxînin. Kom dê vê bi zimanê we ji we re bibêje.